

## Şewat

Saet dihat yanzdehan. Ez li malê bi dersên xwe re bilî dibûm. Ji nişkan ve dengên bi qîrîn û zarîn ketin guhên min. Ez reviyam ber pencereya oda rûniştinê ya ku li rê dinihêre. Mixabin, agir bi xaniyê li hemberî mala me, bi mala Apê Keya ketibû. Jina Apê Keya, Dilşayê serê xwe di pencerê re dirêj kiribû, hewara alîkariyê dikir. „Hewar, alîkariya me bikin! Zarokên min rizgar bikin, hewar!..“ Her du zarokên wê, Delîl û Jêhat jî car caran dihatin ber pencerê û wenda dibûn. Dengê gazî û hewarê kolana me dagirtibû.

Agirê bi mala Apê Keya ketibû, hêdî hêdî xwe diavêt xaniyên kêlekê jî. Ez bi lez û bez çûm cem diya xwe û bavê xwe. Min ew bi şewatê agahdar kirin. Piştî vê agahiyê diya min û bavê min çûn aliyê şewatê. Lê beriya ku ew biçin, bavê min ji min re got, „Rohatê min, zûzûka têlefônî dayreya agirvemêrê bike! Jibîr neke, numreya agirvemêrê 112 ye!“

Li ber deriyê Apê Keya geremolek mezin pêk hatibû. Her yekî tiştê digot, kesên li wê derê bêçare dixuyan. Ji derî, pace û penceran dû bilind dibû. Êdî xeterî gav bi gav mezintir dibû. Cînarên li kêleka rastê û çepê dest pê kiribûn ku malên xwe vala bikin. Lê pir baş bû ku, ji bilî hinek dû, tu ziyar negihîşt xaniyên wan.

Piştî çend kêliyên din du erebeyên agirvemêr û ambûlansek hatin cihê bûyerê. Karmendên agirvemêrê anîn li jêr, di tanga pencerê de çadir vegirtin, dû re jî ji Xaltîka Dilşayê xwestin ku ew zarokan di pencerê re bavêje xwarê. Dilşayê bi lez û bez Delîl û Jêhat li pey hev avêtin xwarê. Dû re jî Dilşayê xwe ji jor ve avêt. Lê ji ber ku laşê wê giran bû, ew gelek êşiya û 3 - 4 parsûyên wê jî şikestiyar. Agir û dû li wan gelek bandor kiribû. Hema bigire, hemû porên wan kizirîbûn. Ambûlansê Xaltiya Dilşa û her du zarokên wê hilda û çû. Agirvemêran yekser dest bi karê xwe kirin, lê ji ber ku ew dereng mabûn, karê wan pir zor bû. Di derî, pencere û paceyan re alavî û dû derdiket û bilind dibû. Êdî agir hemû xanî pêçabû, wek zimanê mar, alaviyan xwe dirêjî xaniyên li kêlekê jî dikirin. Heta agir hat vemirandin, hemû tiştên di malê de şewitîn. Bi xanî ve çiqas derî û pencere hebûn, hemû şewitîn û hatin xwarê.

Bi encama vê afatê her kes hem kêfxweş bû hem jî li ber xwe diket. Aliyê mirov pê kêfxweş dibû, mirin pêk nehatibû, aliyê mirov li ber xwe diket jî şewata malê bû.

Piştî derdor hinekî aram bû, diya min û bavê min çûn nexweşxanê. Çend saet şûn ve Dilşa û her du zarokên xwe bi hev re ji nexweşxanê vegeyiran. Me odeya mêvanan ji wan re terxan kir. Hinek paşê Apê Keya jî hat malê. Ew dereng bi karesatê hesiyabû. Diya min û bavê min hinek li ber dilê wî dan. Lê ji ber ku jin û zarokên wî ji mirinê rizgar bûbûn, ew ji bo malê li ber xwe nediket. Şewat jî, dema Jêhat bi heste lîstibû, agir bi perdeya pencera oda rûniştinê ketibû û li malê belav bûbû. Heta diya wî pê hesiyabû, agir ji perdeyan gihîştibû xaliyan û hemû firaqên nava malê.

Ez wê şevê raneketim. Ew xaniyê di nav alaviyên agir da dişewitî, cînarên me yên bê xanî man, gîrî û qîrîna mirovan qet ji ber çavên min nedichû. Piştî du rojan saziya Hîva Sor ew ji mala me birin, di xaniyekî din de bicih kirin. Dema ew ketin vî xaniyê, hemû pêdiviyên wan ên malê amade bûn. Paldank, mase, dolab, firaqên mitbaxê di malê de hatibûn bicih kirin. Ji bo xwarin, vexwarin û lixwekirinê jî bi wan re alîkariya diravî hat kirin.

### Van pirsan bibersivîne!

1. Bûyerek çawa pêk hatiye?
2. Bûyer çima pêk hatiye?
3. Rohat ji bo alîkariyê têlefônî kîjan saziyê kiriye û bi kîjan numreya têlefônê?
4. Dilşa û zarokên xwe ji şewatê çawa rizgar bûne? Kê ew rizgar kirine?
5. Piştî şewata malê, mirov çima kêfxweş bûne û çima li ber xwe ketine?
6. Kê li ber dilê Keya daye? Çima?
7. Rohat çima wê şevê raneketiye?
8. Kê alîkariya malbata Keya û Dilşayê kiriye?